# Sûcên bi Amûrên Sûcê Kêran

Agahiyên pêşîlêgirtinê ji bo welatiyan

## Agahiyan

Dema ku kêran di pevçûnên tund de têne bikaranîn, hesta ewlehiyê ya gelek kesan têk diçe.

### Agahiyên li ser çawaniya tevgerê li qada giştî:

> Kêr li malê bihêlin. Di rewşên nakokî de bi tu awayî hewil nedin ku kêrê bikar bînin.

> Bihesibînin: Tenê hilgirtina kêrê dikare sûcê pêk bîne.

> Kêr ji bo xweparastinê jî ne hewce ne. Vana dikarin pir zû li dijî we werin bikaranîn û we têxin xeterê de.

### Heger hûn bi kêrê werin tehdîtkirin, polîs van şîretan dike:

> Heger di pevçûneké de kêr bê bikaranîn, li hemberî hev negerin, lê birevin.

> Derhal telefonî jimareya acîl 110 bikin.

### Heger hûn bibînin ku kesek kêrê derdixe, polîs van şîretan dike:

> Heger hûn şahîdê bikaranîna kêrê ne: Xwe nexin tehlîkeye de, xwe dûr bigirin û derhal telefonî jimareya acîl 110 bikin.

Daxwaza bilez ya alîkariyê dikare ji bo jiyanê girîng be.

### Girîng

Kêrên piçûk jî dikarin bibin sedema birînên giran an jî, di rewşa herî xirab de, heta kujer bin jî. Birînên kêrê an birînên li ser dest û lingan jî dikarin di demek pir kin de bibin metirsîdar li ser jiyanê.

### Agahiyên bêtir

Hûn dikarin di Rêberên (Leitfaden) jêrîn û li ser malperên jêrîn de bêtir agahî bi dest bixin.

- Programa pêşîlêgirtina sûcan ya polîsê ya herêman û ya federalê: Malpera Kêr dikarin bibin kujer.
  Messer können tödlich sein

- Malpera Polîsê ya NRW:
  Qanûna Çekan (Waffenrecht)

- Pelgeya agahî ya Salnameya Çekan 2024
  Infoblatt Waffenkalender 2024

**Kontakt:**
**Landeskriminalamt Nordrhein-Westfalen**
**Völklinger Straße 49**
**40221 Düsseldorf**

**Stand: Oktober 2024**